Dostên gelê kurd

Pîter Galbirêt

Berhevkirin: Selah Zero

Pîter Galbirît, endamekê çalak e di lijna peywendiyên derveyên civata pîrên Emerîka de û berî her kesekê bizav kiriye ku harîkariya gelê kurd bike. Galbirêt her ji heleweşana serhildana kurdî ya buhara 1991-ê li bajêrê Duhokê, li gel Mam Celal sekretêrê giştî yê (YNK) bû, ji ber rolê wî yê mezin bo berevanîkirinê ji gelê kurd û piştî seredana xwe ya sala 1987-ê bo Îraqê û amdekirina raportek fermî ya civata pîran li ser wêrankirina gund û bajêrkên Kurdistanê, Galbirêtbû astengek berdewam beranber Sedam Hisênî û herdu îdareyên Ronald Rêgin û Corc Boşê bab.

Piştî cejna (Alfesih) ya buhara sala 1991-ê , Galbirêtyek bû ji wan kesanên ku li dumahiyê şiyayî di bin topbarana leşkerê Sedamî ve, ji rûbarî Dicle derbaz bibe û xwe bigehîne Sûriya berî ku leşkerê rijêmê beişî, wî dergehî kontrol bike.

Kasêtên vêdiyo yên ku Galbirêtwêne kirîn û paşî li TV-yên Emerîka hatine nîşandan, yekemîn wêne bûn ku cîhanê ji wê terajîdiya berhingarî gelê kurd bûye dihê agehdarkirin. Demê Galbirêtvegeryaye Waşintonê berdewam bû li ser beravanîkirinê ji gelê kurd û dest bi rêxistina heweka berfereh kir û vê hewê îdara Boşî neçar kir ku harîkariya gelê kurd bike her çende berî hîngê ya du dil bû ji wê harîkariyê.

Galbirêtberdewam li dûv fermanên wezareta derveya Emerîka digeriya û ew neçar kirin ku li gel nûnerên kurdan kom bibin.

Hejî gotinê ye ku reftarê îdara Boşî beranberî kurdan bibû egerê nîgeranî û nerazîbûna du navdartirîn rojnamevanên Amerîka yên xelatê *Polîtzer* wergirtîn, yên gelek berevanî ji doza kurdî dikirin ew jî Cêm Hovland ji rojnameya Waşinton Post û Wilyem Savîr ji rojnameya Newyork Times e.

Jêder:

Ji bîrhatinên rojnamevan Conasan Randil, peyamnêr Waşinton Post.